Irrən ist amtlich – Beratung kann helfen!

Eine Aktion des Berliner Arbeitslosenzentrums (BALZ) in Kooperation mit der LIGA der Wohlfahrtsverbände

Çawa ez dikarim mafên xwe li dijê JobCenterê biparêzim?

Xebatên li ser serlêdanan û pirsgirêkên bi JobCenterê re pir caran bi demeke dirêj dajo. Biryar pir caran şaş in. Gelek pirsên mafdariyê, hem jî yên hin erkên dadgeriyê nediyar in. JobCenter her tim ne rast û ne bi mafdar e. We diviya dest ji hin heq û mafên xwe yên kar û berhemdariyê berneda. Derfetên xweparastin û lêgerîna mafên we hene.

> Girîng: Di daxwaznameya xwe de her tim nav û navnîşana xwe, nimroya xwe ya (BG-Nummer) û sermijara pevçûnê binivîsin.

1. Giliya bêkariyê

Heke JobCenter piştê şeş mehan hîn jî li ser daxwaznameya we biryarek nedabe, hun dikarin li dadgeha civakî (Sozialgericht) doza bêkariyê vekin. Gilî, divê bi nivîskî were kirin. Tarixa daxwaznameya xwe ya JobCenterê di gilînameya xwe de binivîsin. Di gilînameya xwe de binivîsin, ku hun dixwezin JobCenter biryara xwe bide li ser daxwaznameya we. Xercên dadgehê ji bo we ne derbasbar e.

2. Lidijrabûn (îtiraz)

Hun dikarin di nav zemanê mehekî de li dij daxuyaniya JobCenterê rabin. Rê û rêbazên lidijrabûnê di dawiya rûpelên daxuyaniyê de cî digirin. Zemanê lidijrabûnê ji roja ku daxuyaniya JobCenter ketiye destê we de derbasbar e.

Lidijrabûn pêwîst e, bi nivîskî were pêşkêşkirin. Daxwaznameya xwe fêmbar binivîsînin: Ji bo we çi şaş in di daxuyaniyê de. Hun dikarin vê jî binivîsin, ku divê JobCenter daxuyaniya xwe ji ber çav re derbas bike, ji ber ku hesabên wî ne maqûl in, yan jî li gorî dîtina we qezenc kêm hatiye nîşandan. Heke zemanê we yê lidijrabûnê hindek mabe, hun dikarin sedemên lidijderketinê di daxwaznameya xwe de nenivîsînin û wan paşê jî bêjin.

Hemû belge û pêvekên xwe fotokopî bikin. Herî baş ew e, ku hun daxwaznameya xwe bi dest bidin JobCenterê û bi wan bidin erêkirin, yan jî daxwaznameya xwe ya lidijrabûnê ji wan re faks bikin, berê ku hun bi postê bişînin. Ev dê biçespîne ku we daxwaznameyê ji wan re şandiye. Ji ber ku nameyên di posteyê de dikarin winda jî bibin.

JobCenter divê xebatên xwe yên li ser lidijrabûna we di nava sê mehan de tewa bike. Ev zeman derbas be, hun dikarin doza bêkariyê vekin. Ravêj (faraziye/hîpotez) rast e, ku we daxwaznameya xwe bi hemû pêvekên wê ve dane JobCenterê. Fotokopiyeke wê daxwaznameya xwe jî bidin dadgehê.

Kêm zêde mehek berê sê mehên ku derbas bibe, diviya we nivîseke bibîrxistinê pêşkêşê JobCenterê bikira, daku pêdivî be dê pêngava doza bêkariyê bête vekirin li dadgehê. Ev pêngav dê ligorî ezmûnê bimeşe.

3. Gilî

Lidijrabûna we bi ser neket û JobCenter jî, li dij a we daxuyaniyeke lidijrabûnê da, di vê rewşê de hun dikarin di nava mehek de (ji roja ku daxuyanî gihiştiye destên we pê de) giliya xwe bi nivîskî pêşkêşê dadgeha Sozialgerichtê bikin. Fotokopiyekî ji daxuyaniya JobCenterê jî pê ra bişînin. Armanca gilîkirina xwe vebêjin. (Wek bilindkirina pîvanên maf û destkevtiyên we)

Hun dikarin giliya xwe li cem buroya huqûqî ya dadgeha Sozialgerichtê jî bidin qeyîdkirin. Rêbaz û şîretên di vê warê de di dawiya rûpelên belgeya daxuyaniyê de hene. Xercên dadgehê nîne. Hun bixwezin parêzerek bigirin, ji bo ku we li dadgehê biparêze, pêwîst e hun daxwaznameyek bidin Sozialgerichtê ku xercên (mesref) dadgehê ji we nesitîne.

4. Rêbaza tedbîrên dem kin

Heqê pêdiviyên girîng ê jiyanê di Arbeitslosengeld II (pereyê bêkariyê II) de cî digire. Şeş meh xebatên ji bo serlêdanê û sê meh xebatên ji bo daxwaznameya lidijrabûnê pir caran zemanek dirêj e. Ne kêm car ku bêkar û destpêkerên Arbeistlosgeld II rastê tengasiyên biryarên şaş ên JobCenterê tên. Di vê rewşê de derfet hene, ku li gel Sozialgerischtê daxuyanî bête dayîn ji bo tedbîrên dem kin. Dadgeh di nava demeke kin de biryareke derbasbar werdigire û cara pêşî tengasiya we ji holê tê rakirin. Ev biryar pir caran mîsoger dimîne. Lê hun nikarin li ser vê rewşê terka hewldanên xwe bikin. Divê hun berdewam hewl bidin, di pêvajoya dozê de, berdewam bin li ser doza xwe. Heke JobCenter biryara xwe daxuya neke, serdana we ya lidijrabûnê pêk tê û destûrê werdigire.

5. Daxwaznameya kontrolê

Her wiha zemanê lidijrabûnê yan jî yê gilîkirinê ji holê rabe û hun rastê hin şaşiyan werin, ev nayê wê wateyê ku hemû tişt têk çûne. Heke yek yan jî gelek biryar û daxuyaniyên bi qusûr hebin, hun dikarin bi nivîskî daxwaz bikin, ku ew van şaşiyan kontrol bikin. (§ 44 SGB X)

JobCenter di nava şaş mehan de li ser daxwaznameya kontrolê biryarek nedabe, doza bêkariyê jî dikare li vir vebe. Dîsa heke daxwaznameya kontrolê bi ser nekeve, hun dikarin li dijê daxuyaniya mendelekirinê (red kirin) di nav mehek de îtiraz bikin. (ji roja ku daxuyanî ketiye destê we)
Li hember lidijrabûna neserketî, dikare gilî bête pêşkêşkirin.

Ez dikarim xwe li kuderê biparêzim?

Heke we di rastiya biryara JobCednterê de şik hebe, hun dikarin biçin buroyeke amojgariyê. (Beratungstelle) Hun dikarin li wir di derheqê maf û erkên xwe de agahdarî (Information) û şîretan werbigirin û pêdivî hebe hun ê werin parastin. Daxwazname, nivîs û belgeyên xwe kom bikin.
Hun dikarin navnîşanên buroyên amojgariyê yên Berlinê li jêr peyda bikin:

www.beratung-kann-helfen.de

Hun dikarin parêzereke/î pispor jî ji xwe re bigirin, ji bo mafên we yên sozial biparêze, nûneriya (temsîl) we bike. Ev şîret û nûneriya parêzer dê li dijê JobCenterê hêviyê bide daxwazên we. Helbet parêzer naxwezin bê heq kar bikin. Heke sîgortayeke we hebe ku mafên we biparêze, yan ji hun endamê sendîqayek bin, divê hun ji wir agahî werbigirin, gelo ew dikarin heqê parêzer û xercên dadgehê bidin? Heke na, derfet hene ji bo nûneriya dervayê dadgehê û alîkariya dayîna amojgariyê û her wiha jî, ji bo alîkariya xerc û mesrefên dadgehê.

Çawa ez dikarim alîkariya amojgariyê werbigirim?

(Ji bo nûneriya parêzer a li derwayê dadgehê)

Heke pêdiviya we bi parêzerek hebe, hun dikarin biçin dadgeha (Amtgericht) taxa (Bezirk) ku hun lê rudinin û li wir daxwaznameyek bidin ji bo alîkariya amojgarî û belgeya nûneriyê. Divê hun van belgeyên jêrîn jî bi xwe re bibin û bidin wir:

- Daxûyaniya pevçûn, yan jî daxuyaniya lidijrabûn a JobCenterê
- Belgeya kirêya xanî ya aktûel
- Belgeya qezenca we
- Belgeya serweta we

Wek tedbîr divê hun meqbûza banqeyê (Kontoauszüge) ya meha dawî, pêwîst be yên sê mehên dawiyê jî bi xwe re bibin. Belgeya nûneriyê ji aliyê dadgehê ve divê hema were erêkirin û hun wê werbigirin bibin pêşkêşê parêzer bikin, daku ew dest bi alîkariya we bike. Bi vê awayê alîkariya amojgariyê dipejire. (tesdîq dibe) Lê divê hun tenê 10 Euro beşek ji heqê parêzerê/î bidin.

Dadgeh pir caran alîkariya amojgariyê bi nîşandana sedeman re mendele dike. Mîna: We dikaribû agahdariyên xwe ji JobCenterê werbigirta, we dikaribû bi xwe lidijrabûna xwe pêşkêş bikira, yan jî hinek rawestiyana heta ku we daxuyaniya lidijrabûnê werbigirta ûwd…
Ji ber vê yekê dev ji hewldanên xwe bernedin. Daxwaza hevpeyivînê bi berpirsiyarê bilind (şef) re bikin. Zelal bikin, ku hun bê alîkariya parêzer katine vê rewşê û gelek hewldanên bê encam dane, daku pirsgirêkê bi tena serê xwe bi JobCenterê re çareser bikin. Heke hun bi vê qîma xwe neyinin, hema daxwaza sûdwergirtina ji rêya qanûnî û biryareke nivîskî bikin. Heman daxwaznameyê bidin buroya dadgehê jî û tê de binivîsin, ku we pêdivî bi alîkariya parêzer heye.

Çawa ez dikarim alîkariya xercên dadgehê (Prozesskostenhilfe) werbigirim?

(Ji bo nûneriya parêzer a di dadgehê de)

Dema ku hun giliya xwe, yan jî dxwaznameya xwe ya ji bo tedbîrên dem kin pêşkêşê dadgehê dikin, di heman demê de hun dikarin li wir ji bo xerc û mesrefên dadgehê û ji bo heqê parêzer jî daxwaznameyek pêşkêş bikin. Bi vê awayê parêzer jî dipejirîne, ku ew dixweze ji bo we nûneriyê bike.

Alîkariya xercên dadgehê dipejire (tesdîq dibe) tenê, heke hêviya biserketina giliyê hebe. Bilî vê rewşa we ya aborî tê kontrolkirin, bi vê awayî eşkere dibe ku, ji bo xercên dadgehê ne Arbeitslosengeld II, berevacî li gorî § (paragrafa) 90 SGB XII Sozialhilfe eleqeder e. Bi pejirandin û dayîna alîkariya xercên dadgehê re heqê parêzer yan bi giştî didin wê/wî, yan jî destûr didin we ku hun bi teqsîd bidinê. Heke dadgeh alîkariya xercên dozê mendele (red) bike, divê hun bifikirin, gelo di vê rewşê de hun dikarin heqê parêzer bidin? Heke hun doza li dadgehê qezenc bikin, bi qanûnî divê JobCenter heqê parêzera/ê we bide.

Zêde agahdarî di înternetê de li jêr vê navnîşanê hene:

www.beratung-kann-helfen.de

Têkilî: (bê amojgarî)

Berliner Arbeitslosenzentrum
evangelischer Kirchenkreise (BALZ) e. V.
Vorstand – Frank Steger

Kirchstraße 4, 14163 Berlin
Tel. (0 30) 8 01 40 61

www.berliner-arbeitslosenzentrum.de